

# Bi endametî, tişt hîn çêtir dibin.

## Gelek sedem hene ku mirov di nava IG Metall de be.

# Die IG Metall: Bi hev re ji bo jiyanek baş

Tu dixwazî ji bo dahatek dadmend,
şert û mercên baş yên kar
û bêtir dadmendiyê bixebitî?
Em jî.

## Jiyaneke baş **karekî baş e.**

Em – Die IG Metall: Bi zêdetirî 2.1 mîlyon endaman re, em bi domdarî bi xebata baş ve girêdayî ne. Ji ber ku kar hêmanek diyarker ya jiyana me ye. Ji bo ku kar jiyanek baş mimkûn bike, hêza afirîner a civakek xurt pêwist e.

**Peymanên hevpar standard diyar dikin**

## Tu **şertên birêkûpêk** û **mafê hebûna wan** dixwazî?

Berhema me ya herî xurt peymanên me yên hevpar e. Ew, şert û mercên kar yên wekî mîqdara dahatê, saetên kar yên heftane, mafê tatîlê û zêdekirinan, piştî hîndarî (Ausbildung) mafê wergirtina karê, mafê perwerdehiya bêtir û domdar û her weha derfeta ku mirov bikaribe bi nermî ber bi xanenişînbûnê ve biçe, rêk dixin. Peymanên hevpar di pîşesaziya maden û elektrîkî de, di pîşesaziya hesin û polayê de, di sektorên qumaş û cil û kincan û dar û plastîkê de, di

sektora ITK´ê (agahî û komunîkasyon) de û her weha di bazirganiya otomobîl û elektrîkê de tên bikaranîn. Û ew ne tenê li ser şîrketên bi hev re lihevkirî de bandor çê dikin, lê di heman demê de ji bo tevahiya sektorê jî standard diyar dikin.

↗ **igmetall.de/tarife**

**Parastina qanûnî** § 27 ya Zagona IG Metall

## Tu dixwazî **baş werî şîretkirin û temsîlkirin?**

Em bersiva hemî pirsên te yên di derbarê cîhana kar de didin. Dema ku dor tê tesnîfkirina rast, kontrolkirina peymanên kar an şehadeyan an di rewşa herî xirab de, îbtalkirina peymanan, em bi şîret û piştgirî li kêleka te ne. Di rewşa hebûna nakokiyan de, wekî endam, tu dikarî şêwirdariya hiqûqî ya me bikar bînî. Em li derveyê dadgehê piştgîriya te dikin û bêguman eger pêdivî be, li pêş dadgehê jî di hemû dozên hiqûqa kar û di hiqûqa civakî de jî! Ji ber vê yekê em, wek mînak, li hember ajansa kar, sîgortayên tenduristiyê, sîgortaya teqawidiyê an jî komeleyên pîşeyî te temsîl dikin.

↗ **igmetall.de/rechtsschutz**

**Piştgirî** §§ 23 û 24 yên Zagona IG Metall

## Tu dixwazî **alîkarî bikî û vê yekê bi kesên din re** bikî?

Em di nakokiyên xebitandinê de piştgiriyê didin te: Meclîsên me yên xebatê yên IG Metall baş hatine

perwerdekirin, IG Metall ya herêmî rewşa şîrketan dizane û pabendbûna te bi eşkere hewce ye. Die IG Metall di dema damezrandina meclîsên xebatê de û di nakokiyên li ser danûstendina hevpar de zerûrî ye. Eger grev çêbibe, die IG Metall dê li gorî zagona xwe piştgirîya aborî jî dide endamên xwe.

↗ **igmetall.de/leistungen**

**Xizmetên din** §§ 26, 28, 30 yên Zagona IG Metall

## Ji bo te, **piştevaniyê** divê li ber deriyê fabrîkê bi dawî nebe?

Her weha di qezayên li derveyî kar de jî çê dibin, em li cem te ne. **Bîmeya qezaya bêhnvedanê** ya me li çaraliyê cîhanê derbas dibe û serbixwe ji wê yekê ku te li malê, li baxçe an dema rêwîtiyê de qezayek kiribe: Bi otomobîlê, motorsîklet, an bi duçerxa çiyayê be– li nexweşxaneya ji bo 48 saetan an jî bêtir bimînin, sîgorteya nexweşiyê dikeve dewrê.

**Rewşên acîl yên kesane yên awarte** piştgirîya darayî ya bilez û bêtevlîhev hewce dikin. Bêguman, die IG Metall di bûyerên felaketê de yên ku hebûnê tehdîd dikin, wek lehî û karesatên xwezayî jî dibe alîkar.

Û eger ya herî xirab biqewime – di rewşa mirinê de – em li gorî zagonê piştgirî didin endamên xwe û kesên girêdayî wan ên sax jî.

↗ **igmetall.de/leistungsrechner**

Nûvekirî bimînin

# Tu **dixwazî werî agahdarkirin û biryarê bizanî?**

Em di broşur û rêberên xwe de û li ser malpera igmetall.de derbarê mijarên girîng yên sendîkayan û civakî de agahiyên berfireh didin. Em di semînerên xwe de di warê polîtîkayên şîrket û sendîkayan de perwerdehiyê didin. Torên me yên ji bo danûstendina pratîkî ya bi hev re hene, mînakî, ji bo jinan, xwendekaran an mirovên pir jêhatî.

Kovara me ya endaman **metall. Dein Magazin** her du mehan carekê agahdarî, rapor, reportaj û rastiyên balkêş yên cîhana kar pêşkêşî te dike.

Hemî xizmetên me ji bo endaman belaş in.

**»Eger karkerêkî Maden bixwaze ji alîyê sosyalê de bi awayekî minasib û bi bandor were temsîlkirin, pêdiviya wê/wî bi endametiya IG Metall´ê heye.«**

Ji hukmê dadgeha Federaliyê, hate weşandin li 10.12.1984, Î ZR 91/84

# Em. Die IG Metall.
## Sendîkayek xwe dide nasîn.

Tu dixwazî li ser die IG Metall bêtir zanibî? Kovara me »Wir. Die IG Metall.« bi zelalî radigihîne ku em doza çi dikin, em çi pêşkêş dikin û sendîka tê çi wateyê. Ew di her pakêtek agahdarî de heye û dikare bê pere li vir were daxwazkirin

**↗ igmetall.de/infopaket**

Rasterast bibe endam li ser

**↗ igmetall.de/beitreten**

Girêdayî û agahdar bimîne.
Siparîşa nûçenameya bide li ser

**↗ igmetall.de/infoservice**

**Impressum**

IG Metall
Wilhelm-Leuschner-Straße 79
60329 Frankfurt am Main

Verteten durch den Vorstand,
1. Vorsitzende Christiane Benner
Kontakt: vorstand@igmetall.de

V.i.S.d.P. / Verantwortlich nach § 18 Abs. 2 MStV:
2. Vorsitzender Jürgen Kerner

www.igmetall.de

Titelfoto: IG Metall

Stand: Juli 2024

PN: 1000778A

Kurdisch